

FRANCESCO MARILUNGO

**JI MEKANÊ SIRGÛNÎYÊ BER BI CIHÊ NASNAMEYÊ VE:
TEMSÎLÊN WÊJEYÎ YÊN BAJARÊ AMEDÊ DI WÊJEYA KURDÎ
YA NÛJEN DE¹**

WERGERA JI ÎNGILÎZÎ: SİNAN GÛLTEKİN

Mekan bi piranî weke têgeheke berfireh û razber tê fahmkirin. Her çiqas em peyva “mekan”ê di axaftina rojane de bi wateya tiştêkî şênber û hişk bi kar tînin jî, heman peyv bo destnîşankirina wateya bêsînordariya *mekanê* der-dinyayî (*extraterrestrial*) nîşan bide jî, cîhan, an jî dibe ku di wateya derheqê razberîya geometrîyê û mekanê Euclidean de bê bikaranîn. Mekan hebûneke necûdakirî ye, magmayeke bêsînor e ku yek dikare tê de bi hêsanî winda bibe. Ji bo biserketin, fahmkirin û jîyînê, bi alîkarîya çend cure koordînatên, divê em têkevin nav pêvajoyeke veguherîne. Koordînat ji bo dîyarkirina cih, navgînên muhim in, ew tişt in ku cihanê diafirînin. Li ser rasteka vawêrnebar a mekanê, cih hîmên wateyê ne, xal in ku dikarin bîr ferqkîrin, xalên cihdîyarkirinê, xaçerê ne, elementên nexşeyan in. Ne ewqasî sade ye, cîh parçeyên mekanaan in ku mirov peywendîyên bihes ên dîyar bi wan re ava dikin. Tim Cresswell vê yekê sentez dîke bêtir berçav dike, (Cresswell 2004, 10): Mekan, nexwe, ji cih cuda dibe û dibe alemeke bêwate, - weke ‘rastîyeke

¹ Ev gotar versiyona berfirehkirî ya gotara min “Di Navbera Cih û Mekanê de: Şêmûga Bergehê” ye, ya ku min di konferansekê de peşkeş kirîye. Li Dublinê, Trinity College, Hezîran 2014.

jîyanê' ya ku wekî wan, koordînatên bingehîn hildiberîne ji bo jîyana mirov. Dema ku mirov wateyekê li perçeyên mekanê bar dikin, pê re têkildar dibin, bi awayekî ji awayan mekan dibe cihûwar.

Ji pirtûka Henri Lefebvre, *The Production of Space* (Hilberandina Cîh) (Lefebvre, 1996), ya ku asoyên nû vedike weke ku neqil dike, ku di nav zanistên civakî de weke destpêkirina “dema valahîyê” dinasîne, di salên 1970yê de- cîh dibe ku di vir de weke ‘mekanê hilberandî’ dikare bê pênasekirin: Ev hilberandin di heman demê de hilberandina wateyê ye jî. Ji ber ku hilberandina cîh pêvajoyek e ku em cîhekî tevlihev û xerîb dikin tiştekî bêtir nêzîk ku em bikaribin bi awayekî xwe “li malê” hîs bikin. Pêvajoyeke wilo jimara tevgerên mirov zêde dike û bêtir têkel dike, hin ji wan pir bi kêrhatî ne û hinên din jî pirtir bi hilberandina xeyalê re eleqedar in. A rastî, di pêvajoyê de ku veguherîna cîh dibe mekan, estetîk û sembolîkbûn pêkhatayên pir girîng in. Eger em dîsa li peyvên Tim Cresswell vezerin, (Cresswell, 2004, 9): “Ji bo ku cîh bê watedarkirin û bibe mekan, binavkirin, rêyek ji rêyan e.”

Binavkirin yek ji tevgerên zimannasîyê yê bingehîn e ku mirov dikare dayne derekê; bi vê yekê re jî, tevgerên pirtir tekêl ku weke tarifkirin, gotin, vegotin, nasandin û teswîrkirin, rêyên zêde bikêrhatî ne ji bo hilberandina wate û hestên “nexşekirî” û cîhe “xêzkirî” (Deleuze û Guattari 1987). Cîh û ziman hevkarîyê dikin ji bo afirandina hêmanên mirovî yê wateyên perwerdekirî. Zimanê axaftinê amrazekî bingehîn e ji bo rêvebirinê di jîyana me ya rojane de, nasandin û hilberandina cîhekî ku jîyan lê dibore, herwiha pirtûk, helbest, hevok, peyv miftayên navgîn in di pêvajoya afirandina mexsûs weku “fîzîkî-û-hestewar” –an bi cîhên ‘rastî-û-xeyalî’ (Soja, 1996) ji bilî vê yekê, ji ber ku ziman hêz e, civakên ku bi binavkirin-axaftin-xwendin cuda ne, dikarin binavkirina cîhekî dîyar bi zimanên cuda bikin, ji ber vê yekê jî cîhekî dayî dibe ku bibe cîhekî besî jî di heman demê de; dibe ku bê wateyên cuda ji bo civakên cuda, dibe ku bê nîqaşkirin û vepirsîn bi rîya berhemên wêjeyî. Wekî zanîneke ku berbelav dibe ya cografyanasên mirov rexneya wêjeyî jî dide zanîn (ji bo lê nêrîneke bi giştî û berfireh bnr. Tally, 2003) wêje bixwe jî xwedî cureyêke rehenda xakî ye; bi awayekî, ew dikare valahîya tecrûbekirî bigire ku di rewaniya her-rojî de di sindoqeke sînorkirî yan yekitîya wateyê de di hewe– pirtûkek, helbestek, hwd. Bi vî awayî wêje xezên nexşekarîya hestiyarî yan nexşekarîya derûnî ku xwendevan li hember wê bi kar tîne ji bo “bixwîne” valahîyê resim dike. Dereceya rasteqîmî yan te’rîfkirina (ango cureyê wê) metnekî ne pirsgirêk e li vir, ji ber ku hetta

cihên bêtir cîrokî/xeyalî û nerealîst bi şiklekî di derheqê mekanê de diaxive ku em lê rûdinin û pirtûkê dixwînin. Kesek dikare bifikire, wek mînak, wêjeya ûtopîk a ku bi awayekî berbiçav ji hedê xwe zêdetir dûrî “rastîyê” ye, lê bi rastî di derheqê alîyekî mekanê de diştexile ku em lê dimînin. Ji ber vê yekê, dayîna rehenda wêjeyî ya xakî û valahîyî û karîna wê ya ku mekanaan diafirîne (û xerab dike), wisa xuya dike ku dikare bibe wek xwendineke munasib bo qada cengê ji bo zevtkirina valahîyê (mekan). Bi gotineke din, amrazek e ku valahîyê vediguherîne bo mekanê “me”, ne ku ji bo mekanê “wan”,

Di navbera dîmenên din de, bajar belkî ji her tiştî munasibtir e ji bo nîşankirina pêvajoya ku me li jor bi kurtasî ava kir. Hetta pirtir jî, dema ku bajarek bi awayê çandî bibe qada berxwedana du hebûn, ziman, netew, vegêranan. Bi rastî bajar, pir daxive, wek mekanekî nivîsandinê. Nivîskarê frensîz Michel Butor di metna xwe ya ku bi navê *La Ville comme Texte* de, bi awayekî tehrîkî pêşniyar dike ku “kargîniya bajar wekî ‘ekuya metnan pir girîng e dibe ku em ji xwe bipirsin eger ev ne bingeha rêgezî be (Butor 1982, 36). Goya bingeha hebûna bajar diviyabû ku ewil bibûna ‘pirtûkxane’. Nexwe pirsra ku niha li vir xuya dibe taqîpkirina pêşbînîya “xakî” ya wêjeyê û deqê gelek encamdar e: “Ev pirtûkxane ji metnên kê hatîye berhevkirin?” Bi gotineke dî, ev bajar -pirtûkxane- berhema kîjan koma mirovan e? Bi çi zimanî xeber didin? Gelo bi rastî jî bajar berhemeke komeleyî ya “mirov û komên dîyar” e, wekî ku Lefebvre nîşan dide? (Lefebvre 1996, 102).

[...] bajar berhemek e (*oeuvre*), ne karekî hilberandina amrazên basît e, pirtir nêzikî karekî hunerî ye. Eger hilberandina bajar û têkilîyên civakî hebe, ev hilberandin, ne hilberandina heyberan e, ji nû ve hilberandineke mirovan e ku ji alîyê mirovan ve pêk tê. Bajar xwedîyê dîrokekê ye; ew berhema dîrokekê ye û ew berhem ji alîyê mirov û komên dîyar ve tê afirandin di şert û mercên dîrokî de.

Ji ber vê yekê, carinan bajar encama nakokîyên “du komên dîyar ên mirovan” e ku berhemê (*bajarî*) ava dikin; carinan dibe qada cengê ya ku tê de du komên cuda bi hev dikevin, her yek ji wan koman dixwaze berhema xwe ya hevpar biafirîne. Ji vê bergehê, berhemên zimanî yên devkî û niviskî ‘çekên’ girîng in di vî şerî de; dîsa bi raya Lefebvre bajar heyberek e “nêzîktirî wî zimanî ye, yê ku takekes û kom berî ku biguherînin wê bi dest dixin, an heybereke zimên e (zimanekî xuya, berhema civakeke dîyar, ku ji alîyê komên dîyar ve tê bikaranîn)” (Lefebvre 1996, 102).

Herwiha Sharon Zukin têkilîya simbolîk a dereceya di avakirina bajarekî de wek mekanekî dîyar ferq dike:

Înşakirina bajarekî xwe dispêre çawanîyê ku însan faktorên aborî yê edefî erd, kar û sermayeyê li hev dicivînin. Lêbelê ew herwiha xwe dispêre çawanîya ku ew zimanê simbolîk ê derkirin û binavkirinê manîpule dikin. Dîmen û hesta bajaran nîşan dide ku li ser konseptên pergal û bêpergalîyê û li ser bikaranîna hêza estetîk çi - û kî- divê xuya be û kî/çi divê ne xuya be. (Zukin 1995, 7-8)

Piştî dayina van xalan, ji bo tehlîl û hilweşandina pêvajoya avakirina mekanê yan şerê li ser têşe û xwedîbûna karê hunerî (*oeuvre*) li jêr ez ê bi kurtasî li ser wêjeya ku bi Dîyarbekir/Amedê ve girêdayî ye bisekinim. Ez amaje pê bikim ku, bi dayîna şert û mercên dîrokî û civaknasî yê bajêr, kurd wekî “cîhê sirgunîyê” û bêcîhkirinê tecrûbe kirin heta demên nêz; lêbelê guherînên taybet ên jîyana polîtîk û civakî li Dîyarbekirê di van çend deh salên dawî de, bi aktorên kurdî ku bi awayekî bihêz “heqê bajarî” tayîn dikin, hilberandina nûkirî ya “hîsa mekanê” pêkan dikin.

Berî 1923an a dîroka damezrandina Komara Tirkîyeyê, wêjeya ku behsa Dîyarbekirê dike tenê tiştên seyaxatî û şehrengîz in, (Korkusuz, 2003; Gülhan, 2012). Her çiqas navenda wêjeyê Stenbol be jî Dîyarbekir jî navendekî jîyana ronakbîrîyê bû di dema împaratorîyê de. Hetta helbestvanên ku ji wir in weke Süleyman Nazif an Cahit Sıtkı Tarancı, kêma li ser bajarê xwe nivisîne, ji ber ku “qada bakur” Stenbol, hetta Ewropa azwer bû. Piştî avakirina Komara Tirkîyeyê rewş guherî, Stenbol cihêkî pir-çandî bû weke Osmanîyan, lê paşî Enqere bû navenda neteweperestên tirk, gihiştê asta simbolîk bo wan û ronakbîrên tirk hêza xwe jê wergirtin, weke payîtext jî hate neqandin û ji ber vê yekê jî bû bajarê simbolîk ê Kemalîzmê. Cîyê polîtîkaya Tirkî li derûdora Enqereyê bi cîh bû, hetta bû cîhê îdeal. Weke ku Karaosmanoğlu bi awayekî eşkere dinase di romana xwe ya bi navê *Ankara* de, navê vî bajarî “wateya îdeal lê bar bû, welatekî xeyalî xwe spart rabirdûyeke xeyalî”, (Karaosmanoğlu, 2013). Ji aliyê polîtîk û avahîsazîyê ve, Enqere bû mîhengê rastî-xeyalî ji bo bajarên din ên li Tirkîyeyê. Lewma, dem û cîh li Dîyarbekîr bûne hem-demî bi Enqereyê re, bi vê yekê re avahî, binesazî, ayînên civakî, bi mudexleyê ve bajar “modern kirin”. Dîyarbekir, bajarekî pir-nijad di herêmeke pir-nijad de, dive veguhere û bibe “bajarê Kemalîst” (Houston, 2005), bi navê xwe, bi awayekî taybetî neteweyê tirk îşaret bike û asîmîle bibe, eger nebe bi tehde û bêdengkirina neteweyên din wê pêk bê. Her wekî bi rêya xebatên ilmî yê derbarê mijarê jî derxistîye holê, (Aktar, 2009; Çağlayan, 2014;

Üngör, 2012 û yên din) sîyaseta tirkî-kirina Diyarbekirê xwedî têkilîyekê pir mezin e di dehsalên ewil ên komarê de, ji ber ku rêvebiran xetereya “yên dî” û qîymeta stratejîk a bajêr dizanibû û ferq kiribû. Du romanên ku ji aliyê nivîskara xwedî îtîbar a tirk Halide Edib Adivar, *Kalp Ağrısı* (2000, 1924) û *Zeyno'nun oğlu* (2000, 1928) balê dikişîne ser bajêr, wateyên veşartî dixê nav rêze-bûyeran û bajêr bi eşkerahî bi awayekî orîyantalist te’rîf dike, wekî cîhekî ideal û neteweperest ku tê de Diyarbekir sembola “Rojhilat” a navxweyî ye (Öncü, 2011), weke cîhekî paşdemayî, bêpergal, bi şiddet herwiha tehrîkî, serhildêr û heqkirî ji bo enerjîya herî pir a elîtên Kemalîst teswîr dike. Piştî çend dehsalan, dîsa Yakup Kadri Karaosmanoğlu, ku baş dizane bajar û cîh pir girîng in di nîşankirina wateyên polîtîk û çandî de, di romana wî *Panoramayê* de (ji sernav jî tê fahmkirin ku romaneke “cografî” ye) (Karaosmanoğlu, 1987) nihêrîneke nû li ser statuya polîtîk û cografî ya şoreşa Kemalîst pêşnîyaz dike. Li warekî wilo, Diyarbekir li dijberê Îzmîrê tê dîtin, ji bo nirxandina baş û nebaşîyên şoreşa Kemalîst bi kêr tê; Diyarbekir, ne pêwîst e ku mirov bibêje dibe figurekî neserkeftî yê Kemalîzmê. Di beşa çaran de pirtûk wiha dest pê dike; mamosteyê felsefeyê Ahmet Nazmî nameyan ji Diyarbekirê dinivîse û hevalê wî yê nêz Cahît Halîd li Îzmîrê werdigire. Ahmet nameyên xwe bi gilîyan tije dike, gilîyên wî ji bêdilîya Diyarbekirê ye ku naxwaze nirxên modernist ên Kemalîzmê bipejirîne:

Baş e, di nav van dîwaran de pergaleke kiretî û xwîntehliyê heye ku ji rabirdûyê maye, eywax, pêş dike [...] lidijderketina hemberî teşebusa pakkirin û nûkirinê. Hetta tîpa “r”yê ya şoreşa peyvan, ku me bi qîrîn gotîye bi salan, hêj negihaştîye vir. (Karaosmanoğlu, 1987, 109)

Hevalê wî Cahît dibêje ku şoreş bi piranî tiştekî domdar e, lewma divê tu hêvîya xwe jê qut nekî û divê hewleke bihêz pêk binî da ku Diyarbekir bibe parçeyekî tirkî, parçeyê xakeke rastî-xeyalî. Di giştî de, ji bilî hewla dewletê ya veguhertina bajêr, di wêjeya tirkî ya Kemalîst de Diyarbekir dorhêleke valahî-demî ye. Binyadeke wêjeyê ya bi vî rengî ku hewla sewîyeyên çandî ku ji aliyên dewleta tirk ve hatine dayîn îfade dike. Ji ber ku armanca wê veguhertin û tirk-kirina cî ye; bi berfirehî jî kurd, Başurê-Rojhilatê welêt, operasyonê hat sepandin di qademeyên cuda de, ji leşkerî heta çandî (Jongerden, 2007; Öktem, 2004; Öktem, 2008; Üngör, 2012; Çaglayan, 2014; Aktar, 2009).

Bi van sedeman, ev polîtîkayên tirk-kirinê ji alîyê Tirkîyeyê ve li başurê rojhilatê welêt hatin sepanandin, bi dîqçeteke taybet li ser Diyarbekirê hatin sepanandin, awayê hîsa cîhekî ya kurdan lewma nakok e û gelek caran bi tehde ye:

Vejîndina bajarên weke cîhên Kemalîst ku kurd ji zû de piranîya nifûse bû sedema dîasporaya kurdan. Koçber û multecîyên ku ji bajarê xwe der bûn dîasporaya kurdan ava kirin. Li hêla dî, netewe-dewlet carinan kujerî kirîye ji bo yekkirina herêman weke herêmên Kemalîst. Ev tevgera bû sedema wêrekîya hin kurdan ku xwe weke neteweyekî texeyyul bikin an xwe weke ûmmeteke di bin dagirkerîyê de, yanî li welatê xwe, xwe wekî bajarvanên sirgûnî hîs kirin. (Houston, 2008)

“Tirkkirina” dorhêla bajêr a neteweperestên Tirkîyeyê û polîtîkayên muhendîsîya civakî (Jongerden, 2007) yên ku li herêma kurdan dihatin sepanandin, rê li ber wê yekê vekir ku kurd xwe di asta kulturî de li welatê xwe bê cih û war hîs bikin. “bêparbûna ji cih û war” (Scalbert-Yücel, 2010, r. 248) bû alîyekî dubarekirî yê îfadeyên çanda kurdan a nûjen. “Welat” ji dêvla ku bibe xak û civakeke xeyalî, taybetmendiyên esrerengîz ên Freudî bi dest xist (*Unheimliche*): Cîhekî ku em wek “mal”ê dizanin lê ne weke “mal”ê hîs dikin. Hebûna şertên sîyasî di bin nîrê dewleta tirk de, “welat” bû cîhekî pêşerojî ku divê bê bidestxistin (xakeke pîroz wek Qidûsê, binêre Preston û Housley 1994), ev cîh ne wekî tiştekî heyî û rastî ye, lê cîhekî pêşerojî ye (Galip, 2015). Ji bo rewşa bajarvanîyê, bajar (bi taybetî Diyarbekir) ji dêvla bibe cîhekî ku yek weke cîhê xwe hîs bike û pê bihêz bibe, bû cîhekî fetlonekî ku yek xwe wînda dike, nasnameya xwe jî wînda dike. Herwiha dîsa ji ber sedemên bi vî rengî, weke ku gelek zanyaran nîşan da (O’Shea, 2004; Van Bruinessen, 2013; Galip, 2015, yên din), neteweperestên kurd mîten xwe bi awayekî kevneşopî çîmenên ji çiyayan û dorhêlên gundane neqandin wek cîhekî ku bi awayekî bibandor bi nasnameya kurdî ve girêdayî ye, wek mînak romana yekemîn, *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo (Shamilov, 2009). Cegerxwîn ku helbestvanekî netewî bû, jîyana gundîyan xist navenda mijarên berhemên xwe. Bi awayekî kevneşopî, têkilîya lawaz a bi xwezayê re, ku dixwestin paqijîya kurdbûnê destek bike û biparêze, halbikî bajar wek cîhê bişaftina çandî dihate dîtin.

Ji serî heta niha di wêjeya kurdî de Diyarbekir/Amed- belkî hêmanê bajarvanî bi giştî- bi rûbereke nedîyar hat behskirin. Weke ku ji alîyê Clémence Scalbert-Yücel ve di *Le monderurale dans la poésie Kurmandji en Turquie* (Scalbert-Yücel, 2010) de hatîye analîzkirin, hin helbestvanên kurd ku di salên 1940 û 1950an de ji dayik bûne

(wek mînak Berken Bereh, Arjen Ari), ku dixwestin seferberîya kurdan û şerê 1990î vejînin, meyldar in ku dorhêla gundane îdealîze bikin, (Bihûşteke winda), gund (cihê yekîtiya aşti û çandî), li dijî bajêr, cihekî pevçûn û şiddetê ye. Gund bi figurên xwe yên simbolîk, şivan, berîvan; kulîlkên gund ên sombolîk ku xwezayê nîşan dide û demsalên erotîk, gund bi tehmên xwe ku besît in lê fêkî hildiberîne. Cihê zaroktîyê; cihê berî trawmaya bi şiddet, derxistin, sirgûnîyê. Arjen Arî di helbesta xwe ya “Jînenîgarî”yê de dibêje ku piştî dîtina “rûyê bi jar ê Amedê” jîyana xwe wek penaberîyê dibîne. Berken Bereh derheqê bajêr de wiha dibêje, “Dizanim dêwên we çil serî/ şikeftên we gurxenêq”. Ji bo wan bajar cihê kirina gunehan û îstîsmara karkeran e. Bereh bi taybetî gelek helbestên xwe ji bo karên feqîran ku gundî dev ji wan berdane kirîye terxan; hemal, zarokên selpakfiroş, fahîşe. Di vê zemînê de, bajar bi awayekî bibiryar teslimî destên leşkerîya dewleta Tirkîyeyê bûye û hîsek tune ji bo hunermendê kurd ku xwe aîdî wir bike.

Di heman demê de, hin nivîskarên din, gava ku rewşa neyînî ya bajêr ku ji alîyê “dagirkerên” tirk ve hatîyê avêtine goşeyekê, şermezar dikin, jixwe di salên 1970 û 1980yî de pesnê nîrxê simbolîk ê Diyarbekirê didin, bi vî awayî cihêtiya di navbera dewleta heyî û hewesên kurdan ên di derheqê bajêr de teşhîr dikin. Di romana xwe ya ku yek ji romanên ewilîn e, di “*Tu*”yê de, (*Tu*, 1985), Mehmed Uzun -yek ji berhêmdartirîn nivîskarên kurd ên nûjen e- bi awayekî bikêrhatî nakokîyên ku Diyarbekir ji bo kurdan temsîl dike, sentez dike, herwiha nepenîya bajêr a hestiyarîya bihêz şanî me dike, û alîyên neyînî jî herwiha nîşan dide û bal dikişîne ser pozîsyona mezin a simbolîk a bajêr ku bi kêrî avakirina nasnameya kurdî tê. Bi gotinên Mehmed Uzun, Diyarbekir di heman demê de weke cihekî nîrê dewletê û çavkanîya nasnameyê dertê holê. Di heman demê de bajar ji hêla kurdan, xwedî kanîya têkilîya hezkirin û nefretê ye. Hem şênberbûna fîzîkî ya hîskirina “dagirkirinê” hem jî “nîr” û mînameke zindî ya mimkinbûna rizgarîya kurdan e:

Ha ev Diyarbekir, xweşiya welatê me, jana dilê me ye. Hêviya jiyana me, êşa mêjiyê me ye.[...] Ax, Diyarbekir di dilê me de çengal e, [...] ew guleke sor e. Bîhna we merivan sermest dike, stiryên we jî têşînin. [...] Wê her gav deriyê xwe ji biyaniyan re vekiriye, ew ezimandine. Lê ew ne bi mebasta mêvaniyê, ji bo mayîne, tazîkirinê hatine. [...] Ew bajarê me yê herî mezin e. Serbajar, paytextê welatekî binpê û xelkekî bindest e. Ji lewre wê kêfxweşiyên mezin û stûr ji zû ji bîr ve kirine. [...] Bajarê xewnan e. Her tişt tê de heye. Kevn û nû, rindî û xirabî, xweşî û gemarî, merivahî û barbarî, xebat û sûtalî. Evîn û rik, kêfxweşî û xem, hezkirin û lêdan û her

tişt, her tişt tê de heye. [...] Diyarbekir carna wekî kahniya jiyân, evîn û xweşiye dixuye, carna jî wekî hûtekî ku zarokên xwe dixwe, dixuye. (Uzun, 2005, 99-103)

Tu di sala 1985an de li Swêdê di demeke ku kurdî li Tirkîyê bi awayekî tund wek zimanekî qedexekirî bû, hate çapkirin. Ev, hewla Mehmed Uzun a yekemin e ku xwestîye zimanê kurdî vejîne û asoyeke nûjen bide zimanê kurdî. Teswîrkirina Diyarbekirê di nav van şert û mercan de, û piranîya wan wilo kirine di kurdî de, ev, mafekî bihêz ê xwedîbûna neteweyî li ser bajêr bi awayekî binîqaş pêk tine. Bi saya vî cihê honakî yê wêjeyê, di rastîyê de kurd tiştên ku di 1985an de nikaribûn bikin, niha dikarin bikin: Li dijî serwerîya zexm a dewleta Tirk a li ser bajêr, dîyarî civaka netewî ya xeyalî ya kurdan dike.

Diyarbekir (ku bi piranî weke Diyarbekir an Amed tê bilêvkin, ku ev di helbesta kurdî de asayî ye) di helbestên Rojen Barnas de yê ku di sala 1944an de ji dayik bûye û di 1981an de hatîye mişextkirin û çûye Swêdê û weke damezrînerê helbesta nûjen a Kurmancî tê pejirandin de bi awayekî tim û tim dubare dibe.² Derketina wî ji bo bajêr a ewilîn di sala 1965an de hatîye terxankirin: Li ser bajêr ew nivîsiye: *Çûm Diyarbekir*, (Barnas, 2013). Helbest weke gilîyekê ji bo bajêr bi dawî dibe. Ew di nêrina ewil de hêvîyên pir îfade dike, helbestvan bi nerîna li bajêr dikeve nav hêvîşikestîbûnekê, ku ev ji ber rewşa bajêr e. Ciwan “Ji fikrê xalî / Bê omîd, bê armanc, tevek bêfeyz in”, (Barnas, 2013, 19); kal rûdinin li ber mizgeftan û tenê perestê dikin “hêvîya bo bicîhbûna behîştê”, jin xwe difiroşin, rewşenbîr û rêvebir jî meylidar in bo araqvexwarinê. Benda dawî bi kurtasî hem arezûya helbestvan a ji bo bajêr û hem dilnexweşiya wî tîne zimên, (Barnas, 2013, 19):

Ez reş û tarîbûm, sar bûm di cî da
Ev çi hal, ev çi xew, ev çi rexawet?
Me digot ji bo te canê me fîda
Zeriya enîreş, bajarê Amed!

Rastî bi bajarê ku “wî xwe feda kirîye” re ne guncav e. Lêbelê, paşî di hunermandîya Barnas de, bi taybetî jî piştî sirgûnîya wi bo Swêdê di salên serê

² Şener Özmen, *Uykusu Bölünenler, Çağdaş Kürt Edebiyatı: Söyleşiler, Çeviriler Ve Okumalar* (Diyarbakır: Lîs, 2013, 80). Temo di antolojîya xwe de wî weke “yek ji giringtirîn helbestvanê helbesta modern a kurdî” pênase dike, (Selim Temo, 2007, 1436). Arjen Arî antolojîya xwe ya “Bakûrê Helbestê” bi helbestvanîya Rojen Barnas dide destpêkirin, (Arî, 2011).

1980yan de, Diyarbekir bû semboleke pir girîng a berxwedan û li hewlê. Bi rastî, di nav berhevoka helbestên wî ya pêşî de, *Li Bandeva Spêdê* (1979) herî kêr du helbest ji bo Diyarbekirê ne. Yek ji wan “Êzingvanên Diyarbekirê”, terîfeke şertên civakî yên êzingavnan a rastîbîn e, bi teswîreke baş a Çemê Dijleyê, “*Keleha Diyarbekirê keleke bilind/ û reş diçirise, şemal...şemal/Li binê kelê/ Dicle.*” ya reş û bilind, û karê niştecihên wê. Lêbelê, helbesta dî ya ku terxan e bo Diyarbekirê, pir berbelav bû bi awayekî derasayî (Bi taybetî jî piştî ku Ciwan Haco guhertoya wê ya kilamî çêkir, di sala 1981ê de, li *Diyarbekir*). Sernava wê *Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir* e. Sernav ji şewaneya dûbarebûyî ya helbestê tê, û benda di navbera Barnas û Diyarbekirê de bi awayekî sîmî îfade dike, “kolana navê xwe” tê wateya cureyeke navnişanî li ser cîh û kelijîna nasnameya mirov a bi bedena bajêr re. Nêrîneke nêzîktir dê pêwendîya seretayî û kûr bi awayekî aşkeretir şanî me bide. Risteyên berîn demildest dînamîkên binîqas ên hezkirina kurdan a li hember bajêr wekî nimûne berpêş dike (Barnas, 2013, 27):

Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir

Gava ku stêrk

Li esmana stûxwar,

Gava ku

Ney û bilûr û tembûr

û dehol û zirne

Sar

Bûn.

Şertên “kolebûnî” yên ezman û stêrkan, yekîneyeke kurdî ya nasnameya – stûxwar- û xakî xwezayî ya kurdan dide pejirandin; gava ku helbestvan navê xwe li ser dîwaran dikole, yan bi gotineke dî, dema ku navê xwe li ser bedena fîzîkî ya bajêr dikole, naskirineke kûr a di navbera xwe û bajêr de tîne zimên. Derdor dikeve nav bêdengîyeke wek îmajêke pir nêz a “bêdengîyê” ku tehde ye li ser zimên û çanda kurdan, (Barnas, 2013, 27):

Û cobar

Nedixuşîn di nivînên xwe de seraser

Sosin û beybûn û rihan

Ne d’bişkîfîn di bûtîkê de.

Tariyên giran

tûj û kûr
Bi zûrezûr û bi orînekejakaw
Bêfikare,
bêpaxav
dihelişî
li serwelatê min
Bi giyanek pola
Min nave xwe kola
Min nave xwe kola li bircên Diyarbekir.

Gerdûn û ezman ziwa bûne û diqîrin, ji ber ku hêza rêvebir a li ser bajêr bi derdora xwe re ne guncav e. Ji ber vê, berxwedana helbestvên a li bajêr, kiryara wî ya nasnameyê bi wicûdê bajêr ve hildigire û dadikeve û hewa diçilmise û dibe tirsnak. Taybetmendiyên bingehîn ên bajêr (li vir, navên derîyan) ji nû ve terîf dibin da ku kefarete û esaleta cografyayekê îfade bike, (Barnas, 2013, 29):

Ez
Di Deriyê Niştîmanî re ketim hundir
Min
Deriyê Neteweyî bi zerzenga xemiland
Û li ber Deriyê Serxwebûnê
Şer kir
Bêwech mabû baxçeyê Deriyê Felatê
Min tê de
Şaxên serbestiye çikand
Tovê xaw ên dariyê werkir.

Berxwedan, lidijderketin û cîyê bajarvanî bi bicîhkirina çar navên derîyên Diyarbekirê bi çar nirx û armancên bingehîn re tên îfadekirin. Bi saya bi nasname kirina helbestvên (û xwendevên) a nasnameya şexsî ya bi bajêr re (kolana nav li ser bircan) pêvajoya veguhertin û ji nû ve avakirinê dest pê dike, li cihê ku tarîfî serwer bû û rih tenha bû, niha şitl û tov hatine çandin bo nişfên pêşerojê. Berxwedana nasnameyê rih bi ihtimalên vejandina çanda kurdî mezin dike; helbest wiha bi dawî dibe: “Ez duh şehîd bûm/ îro nûhatim”, (Barnas, 2013, 29)

Berhema din a Barnas, cara ewil li sirgûnîyê çap bû, navê bajêr bi sernavê *Heyv li Esmanê Diyarbekirê* vediguhezîne (1983). Helbesteka ku di berhemê de çap bûye, “Ameda min” dîsa qîmeta kûr a ku helbestvên dayê bajêr, bi metaforên dubarekirî yê berdarîyê û hevneqîşkirina navbera helbestvan û Amedê îfade dike, (Barnas, 2013, 185):

Ameda min [...]
Xweziya min li te tov
Xwîna min li te baran
Cîran
her çiqas ker û lal bin jî
-bo kêrhayên xwe-
Tu adan î
Tu serxwirê dijmin
Tu nimaya serxwebûna niştiman î
Û jîndewariya me.

Weke helbesta pêşî, mijara bereketê bi bedena helbestvên-bajêr ve hatîye girêdan. Bajar weke semboleke komeleyî tê yadkirin, weke peydekerê adanê yê sembolîk ji bo berxwedana neteweyî, gava ku li hemberî vê, hêvîyên şexsî li derdora bajêr berbelav dibe; şexsîyeta wî wateya fîzîkî ku karyar e bo bajêr bi dest dixê. Her ku dîtina motîfê helbestvên ku dixwaze di navenda bajêr de bimire “jinûve xêrhatin” di malzaroka bajêr de ne kêr e, li vir Barnas ne têne berbelavbûna xwe di nav rihê bajêr de xeyal dike, lê vêya weke vebêhênerîyekê ji bo pêşeroja bajêr jî difikire. Herwiha, di helbesta “Heyv li Esmanê Diyarbekirê” de, Barnas mirovan vedixwîne bo ku “Bibin bager/ Bibin lehî / Û xwe berdî deşta Diyarbekirê / Bajarê Amedê xêlîreş/ Bajarê Amedê şerpeze”, (Barnas, 2013, 215). Hema piştî wê, ew şîretan li bajêr dike: “Megirî Ameda min, megirî / Xêlîya reş vegire / Lê, tu car û tu car / Bê mefer mebe”, (Barnas, 2013, 216). Nedilşadî ji ber dagirkerîya kolonyal a bajêr ku ji alîyê tirkan e pêk tê, hêmanên xwezayî (firtone, tofan) li dijî îşareta guncan a ku di navbera bajêr û dagirkeran de ne. Heyv û dîwarên Diyarbekirê di dîyalogeke helbestkî de dimînin ji serî heta dawîyê, helbest weke metaforeke aşkere ya dirûvîya di navbera bajêr û xwezayê de ye hatîye bikaranîn; Barnas di dawîyê de bi awayekî aşkere têgihîja kolonyal a dagirkerîya tirkan îfade dike, (Barnas, 2013, 213):

Tu!
Ey neteweyê min
[...]
Fermo ka bêje
Leşkerê romê
Bo kê
Li serê kela Amedê ye
Karê wî çi ye,
Li wê derê li çi digere?

Mijara dijminê ku li bajarê Diyarbekirê ji xwe re kirîye niştigeha di wêjeya kurdî de bi awayekî pir cih girtîye, hem di helbestê de û hem di pexşanê de, jixwe niha mînakeke vêya di Diwana Cegerxwîn a ewil de heye, gava ku ew dijmin terîf dike wiha dibêje, “Li bajarê Amed çikandin çend sêpî”, (Cegerxwîn 2002, 31). Lêbelê, divê em li ser Barnas bimînin, bajar dîsa li vir di nav du berheman de bi cih bûye, *Milkê Evînê* (1995) û *Yelda* (2013). Di helbesta “Gotara Azad” de, Amed weke “sipehî bazarî” terîf bûye”, (Barnas, 2013, 263). Diyarbekir dîsa di navenda helbesta “Sê Tîrêj” de ye. Helbest di derheqê “sê şêran” de ye ku bi xeyalî hatine bajêr û ders ji zarokên bajêr re anîne. Ew şehîdên netewî ne Şêx Seîd (serokê serhildana yekemîn a kurdan ku li bajarê Diyarbekirê di sala 1925an de pêk hatîye), Seyîd Riza (serokê serhildana Dersimê di 1937-38an de ye) û Qazî Muhammed e (serokkomarê komara Mahabadê ye, Mahabad di 1946an de ava bû û zû hilweşîya). Barnas wan weke ronîbûnekê xeyal kirîye ku ji ciwanên Diyarbekirê yên li ber Derîyê Çîyê re rewşenbîrîyê tînin, cihê ku Şêx Seîd şehîd bû (Barnas, 2013, 280). Bi awayekî aşîkar, bi Barnas re, Diyarbekir dibe navenda ronakeşan di neteweperest a kurdî de. Digel ku hîsa dagirkerîyê didome, ev vediguhere, dibe sedema berxwedan û şerefê, dibe bingeh bo vegêraneke berxwedana komeleyî û dibe sedem bo ku bajar aîdî xwe bibînin.

Herwiha, li vir divê em behsa vê navendîbûna sembolîk bikin, an belkî sedema navendîbûnê, Diyarbekir têkelîya xwe didomîne heta demeke nêz, nivîskarekî weke Firat Cewerî romanek nivisî ku gilîyan ji ber şertên bajêr, asîmîlasyona çanda tirkî û şertên feqîrîyê yên aborî dihewîne. Temo, karakterê *Ez ê yekî bikujim*, ji ber ku xwe weke bîyanîyekî li bajêr dibîne diçe dîsa girtigeha ku 15 salan tê de maye, (Cewerî, 2008, 20):

Rast e ku ez jî li vî bajarî dijiyam, lê ji çar dîwaran pê ve çavên min bi bajêr neketine. Ez nebûme şahidê bejinavêtina ciwanên vî bajarî, min mezinbûna bajêr nedît, ez panzdeh salan ji avaçûn û hilatina roja vî bajarî bêpar mam.

Piranîya bajarîyan bi tirkî diaxivin, bi zimanê dagirkeran, û xuyaye ku teslîmî asimilasyonê bûne, dev ji çanda xwe berdane. Karaktera din a romanê Diana ye, jineke ku ji bo şer derketîye çîyê û bûye gerîla, lê paşê bi rezîltî dibe fahişeyek li bajêr. Weke Temo, xwe nerihet hîs dike û bi destên xwe hemêz dike, (Cewerî, 2008, 107):

Ev bajarê qedîm li min bûye dogeh. Ev bajarê ku ez demekê li dû rizgarkirina wî bûm, niha min dixwe, êşê bi min dide kişandin. Ev bajarê ku min bawer dikir ez ê rojekê mîna qehremenekê lê vegerim, niha lê bûme qehpik. Bajarê ku min dixwest rûmeta wî ji bin postalên bîyaniyan rizgar bikim, niha rûmeta min lê di bin lingan de ye.

Têkilîya nerihetbûna li Diyarbekirê ji ber vê ye, rastîya bajêr û hêvîyên simbolîk ên vegêranê ne guncav in. Divîyabû ku bibe “payîtexta” mirovan, lê mixabin bûye “girtîgeha” herî mezin a mirovan. Herwiha, girtîgeha Diyarbekirê, nîşana fîzîkî ya bîranînên trawmatîk e ji bo gelek kurdan, bi taybetî jî piştî salên 1980yî, dibe mijareke wêjeyê ya girîng a neyînî, gelek nivîskar li ser vê sekinîne. Digel ku hîsa aîdbûn û xwedîbûna bajargeh di herema kurdan de bi taybetî jî Diyarbekir, a aktorên kurd di demeke nêz de guherî, ji ber pêşveçûna politikayên diyar li bajêr û bi giştî li heremê. Dema ku di nav pêvajoyekê re derbas dibe ku wekî “serbestkirin” a mekanî tê terîfkirin (Gambetti, 2010; Gambetti û Jongerden, 2011), Diyarbekir bajarek e ku dibe ku hem ji alîyê mekanî ve hem jî ji alîyê çandî ve wekî cihê cengê yê daîmî bê fahmkirin. Têgihîştina polîtîk a li ser rêvebirina herêmî ku ji alîyê aktorên kurd ve tê (Watts 2010), digel ku rehetîyeke îzafî ya li ser qedexebûna çanda kurdî li tirkîyê hebe jî- qonax hilberandine ji bo simbolîkbûn û fêrahîyeke nû ya mekan (Gambetti, 2005; Güvenç, 2011; Scalbert-Yücel, 2009). Ev têkilîyên zû yên ku di asta xeyalî de ye, û wêje xwedî kiriyareke pir girîng e ji bo ku coxrafyayeke hestiyarî ya nû û guncav diyar bike, û ji bo îhtimal û yekkirina hîseke nû ya mekan.

Veguherînên civakî û koça ji kenar bo bajêr di nivê duyemin- yê sedsala bîstemîn de pêk hatîye, dike ku kurd çandêke bajarî û bajarvanîyeke resen ava bikin, dike ku kurd nîrxên xwe biparêzin li hember asimilasyonê û dike ku kurd xwe

biparêzin li dijî dinyaya dîtir ji bo ku ferqkirin, îtîbar, û akredîtasyonekê ji bo xwe-birêvebirinê, (Van Bruinessen, 2013; Cleary, 2002). Ji bo biserketina vê armancê, rabêja çandî ya di derheqê bajêr de divê dev ji kolonîyalkirina barên tirkên neteweperest berde, ji nû ve guncan bibe, ji nû ve ava bike, û paşî divê xwe bigihîne asta hilberandina estetîk û rewşenbîrîyê. Diyarbekir hewil dide ji bo ku di nav şertên tirkî re derbas bibe (taşra, bnr. Temo 2011) da ku bibe navendeke nû ya kurdan. (Dorransoro û Watts, 2009; Yüksel, 2011; Casier, 2011). Li gorî pêvajoya polîtîk û mekanî ku ji aliyê rêvebirên heremî û civaka sîwîl, îmajêke nû ya Diyarbekirê ji wêjeya kurdî derket holê, bi awayekî rapirî ev derketina hestiyarî ku pependîya wê bi cografyaya bajêr ve heye îqaz dike bo domandinê.

Bi guncavbûna nêrina Barnas a bajêr re, di nifşeke paştir de ya ku ji aliyê vê atmosfera nû ya polîtîk tesîr girtîye, em dikarin bi awayekî dîyar bibîn ku bajar çawa bûye nîşaneke bihez ji bo nasnameya kurdî. Di piranîya berhevokên helbestan de ku di salên 1990, 2000 û 2010an de çap bûne, herî kêr helbesteke ku bo Diyarbekirê hatîye terxankirin heye. Di dewamê de, ez ê hewil bidim ku nêrîneke giştî ya hebûn û nirxa sembolîk a bajêr di helbestan de raçav bikim.

Di nav hêmanên dubarekirî de yên ku bajêr didin nasîn, a herî girîng Newroz e, pîrozbahîyeke biharê ye ku koka wê ji çanda Zerduştî û îranîyan tê, di her 21ê Adarê de tê pîrozkirin, peywendîya wê bi êgir re heye, ji nû ve kurd xwedî lê derketin û bû hêmaneke bo nasnameya kurdî di salên dawî de, bi nixên polîtîk ên dijber ve tije ye, bi awayekî geşbûnî têkilîyê datînin di navbera Newroz û Amedê de. Newroz di helbesta Falikên Xaça Evînê ya Ehmed Qerenî de tê pîrozkirin: “Agîrê pîroz...bo Newrozê,/ Agîrê jînê/ Ya li Diyarbekira bindest”, (Duhokî, 2013, 179). Hevî Berwarî, helbestvaneke ji Kurdistanê Başur e, helbestek bi sernavê “Birînen Kela Amedê: Pêşkêş e ji bo Serhildana Amedê” nivîsîye. Di vê helbestê de, bajar wilo vedixwîne: “Ameda min, ey paytexta volkanên agirîn”, (Şikakî, 2012, 202). Hikmet Mehmet Hirorî dîsa têkilîyê dixê navbera Newroz û Amedê, (Duhokî, 2013, 556):

Hemî êvariyên Newrozê

Guryeka geş

Ji ber kêleka kela Amedê bilind dibît

Li hemî mala digêrit

Li hemî kolana diçît.

Bro Omerî di helbesta xwe ya “Agir” de Newrozê wiha pîroz dike “agirê serhildanê” û bang dike ji bo bîranîna êşnak a Zekîye Alkan, ku xwendekareke xama bû ya tendurustnasîyê, xwe li ser bircên Amedê di 21ê Adara 1990an de kire pêşeng û xwe şewitand di protestoyê de, (Omerî, 2013, 101). Hîlmî Akyol berhevoka wî bi *Gula Niştiman* dest pê dike, helbesteke ku sernavê wê “Agir im” wiha didome, (Akyol, 2014, 7):

Ez agir im

Li nav Amedê

[...]

Li her alî Niştiman

Min germ û ronî kir

Tarî zindan.

Li Tirkiyê bûm

Find û çira şevan.

Ez agir im

Li her alî cîhan

Ez ê bişewtînim

Hemû mêtîngeran

Welatê bindestan.

[...]

Ez agir im

Tîra mejiyê neyaran.

Agirê Newrozê li vir semboleke gerdûnî ya dij-kolonîyal pêk tîne ji bo “hemû mirovên mezlûm” û Amed li vir bi awayekî simbolîk payîtexteke vê berxwedanê ye, agir ji nav dilê bajêr bilind bû û ronî kir hemû war û cîhana kolonîbûyî. Heman tişt di helbesta “Newroz Jîyan e” ya Feratê Dengizî de jî heye, li vir “netewek bi yek deng / Hişyar dibe/ û derdikeve ji zindana dirokê” temsîl dike, (Arî, 2011, 586). Ji Amedê “roj pejiqandin” û “bi artêş govend dîlan û şayî/ Kurdan serî rakirin bi SEROKÊ dilovan/ Welatê dî KURDISTAN”, (Arî, 2011, 586). Tewfîq Hêja helbesteke pir dirêj terxan dike bo Amedê “Agirê Amedê: Newroz”. Di teswîreke govendan û pîrozbahîyan, nivîskar bi awayekî dubarekirî yekîtîyeke ku di navbera wî û bajêr de îfade dike di risteyên dewamê de: “Digirîm/ Amed dengê min dibihîze”; “Digirîm/ Amed bi girîyê min dilerize”; “Digirîm/ Amed jî bi min re digirî”, (Arî, 2011, 498).

Nivîskar li vir dîsa vedigere beşa Zekîye Alkanê; keça ku weke stêrka keleha Amedê tê terîfkirin û, bikaranîna rengê êgir qaşo hinne ye, Zekîye “bû bûka Kurdistanê”, (Arî, 2011, 500). Pîrozbahî bi nîrxên polîtîk zêde dibe û xuya ye ku bajar dike bibe şowalyayek: “Erê Newroza serhildanan/ erê, rûmeta azadî û xelasiyê/ Erê, min ji kevirên kolanên Amedê ramusa”, (Arî, 2011, 501). Di rojêke wilo ya pîrozbahîyê de dorhêl jî bi îradeya polîtîkî re guncan e: “xuşexuşa avên Amedê mizgîniya rojêke nû dide teyr / û tilûrên welatê şeyda: Nû Roj, Nû Roj...“, (Arî, 2011, 502).

Metaforeke ku pir caran tê bikaranîn, ji bo îfadekirina têkilîya di navbera helbestvan û bajêr de dîsa hatîye bikaranîn, bajar weke jinekê teswîr dike yan bajar dibe jineke rasteqîn. Metafor bi awayekî eşkere hesasiyeta xwedîbûn, rizgarkirin û parastina bajêr tîne zimên. Di dawîya hehelbesta Rojen Barnas de “Ez hatim Diyarbekirê”, bajar weke “keçeke xweş-deqkirî” ye. Wekî yê din Loqman Polat jî di helbesta “Tu û Amed” de bi awayekî aşkere bajêr dişibîne xweşewîsta xwe Rojdayê, (Polat, 2003, 13). Hemû helbest îlhama xwe ji rabirdûya sirgûniya li Swêde girtîye. Sernava berhemê “Helbestên Sirgûniyê” ye û di helbesta ewil de Polat îlan dike ku bibe “bi hesreta welêt dinalim”, (Polat, 2003, 7). Di helbesta “Tu û Amed” de, dûrahî û rabirdû weke hêmanên diyaroker dixuyên ji bo teşbîhkirina bajêr bi xweşewîstê re, (Polat, 2003, 13):

Bajarê dilê welatê min
Bajarê xewn û xeyalên min
Bajarê xort û ciwaniya min
Amed
Diyarbekir.
Ax bi hesreta dîtina te
li benda vegeerê me [...] Stêrka min li Amedê ma
Nazpêriya min. Rojda.
ji min re nameyekê binivîse.
Bila bêhna te bi nameyê be.
Min navê te ji tirsê dilê xwe re got,
pirsa ji pêlên çem kir
Ez geriyam...
Êdî bes e ev hesret!
Ez li benda vegeerê
di nav xewn û xeyalên xwe de

herdu evîndarên xwe dihezînim:

Yek tu yî, yek jî Amed.

Mînaka dî ya “jinkirina” bajarê Amedê di helbesta “Amed” a Newaf Mîro de heye. Newaf Mîro sirgûnî Elmanyayê bûbû, helbestvan dixwaze bibe bayekî hênik ku ji Qerejdaxê tê û dikeve “Li nav kolan / Sûr û bedena te”, (Mîro, 2007, 59). Helbestvan rasterast bajêr nîşan dide û weke xoşewîstekê terîf dike, taybetmendîyên hîssî: bajar xwedîyê “şahnazî û bedewî”, “bisk û kezîyên”, “bêhn”, “hînav û cengên” e, bajar weke “xewna bakîr û azeban” e”, (Mîro, 2007, 59). Bajar bi piranî bi awayên fîzîkî tê zimên, weke mînak “kevirên reş”, (Mîro, 2007, 60). Digel ku dem diherike bajar hêj “ciwan” e û “bedewî û delalî”ya xwe diparêze, (Mîro, 2007, 60). Bi awayekî ecêb, temsîlkirina bajêr a jinane, dihêle ku helbestvan mijara kolonîbûnê li derdora metafora bakîrebûnê ava bike ku ji alîyê dijminan û mirovên xirab ve tê xerabkirin. Bajar ji her alîyê ve ji alîyê mirovan ve hatîye dorpeçkirin ku dixwazin şeref û namûsa bajêr bînpê bikin, lê bajar “Serî tu car natewînî [...] Li dij artêşa ehrîman û zordaran”, (Mîro, 2007, 61):

Delaliya delalan

Evîna evîndaran

Evîna bê mirin

Tu ti car

Ji zalim û xwefiroşan re

Nebû û nabî yar

Dîyarê dilê min Amed.

Helbestvan texeyul dike ku “perdeyê rake” ji ser “ruyê” bajêr û “hestirên ku diherikin ser hinarikan” paqij bike. Hatina ser hev a têgihên erotîk û polîtîk di helbesta kurdî de, lê bi taybetî daxwaza jinankirina welêt û “rakirina perdeyê” weke metaforeke cînsî û herwiha hişyarkirina li hember zordestîyê, jixwe di helbestên Cegerxwîn de hatibûn îfadekirin, (Metin 2014). Sêgoşeya di navbera helbestvên, bajêr û dijminên bizerar de, bi awayekî termên erotîk tê zimên. Têgiha “xwedîbûnê” xuya dike ku şolî dibe di navbera du wateyên muhtemel de: xwedîbûna cînsî ya xoşewîstê û xwedîbûna xakî ya bajêr. Hîlmî Akyol, di helbesta xwe ya bi navê “Amed”ê de, bajêr wiha difikire, (Akyol, 2014, 9):

Diyarbekir
Bûka rind û hêja
Di dest û di bin zilma neyar de.

Herwiha, Veysi Özgür di helbesta xwe ya bi navê “Amed”ê de ya ji berhema “*Bêje*”yê, li sirgûnîyê bi peyvên evîndarîyê hesrata xwe tîne zimên ji bo bajêr (Özgür, 2007, 16):

Bajarê li kêleka Dicleyê
Warê evînen kûr
[...]
Ka xortaniya min?
Te ez hînî
Evînê kirim
Te da min evîna
Ji binê erdê
Heta serê ewran.

Têkilîya hezkirinê ya bi bajêr re wisa xuya dike ku bi awayekî tund naguhere dema ku em perspektîfa zayendî berevajî bikin. Gulîzer herî kêr di du helbestan de behsa bajêr dike. Di helbesta wê ya bi navê “Bûka Baranê” de mekan bi awayekî aşkere dikeve rengê mirovî û di dawîya helbestê de wiha îtîraf dike, (Şikakî, 2012, 71):

Dilê min ji te dimîne.
Destê min ji te nabe.
Ewqas diherim, tîm
Dijmêrim bajarên
Dilê min dîsa li te dimîne
Amedê.

Gulîzer di helbesta xwe ya “Dîyarê Bakîrê” de bi bajêr re diaxive. Di helbesta “Ba(jar)”ê de Gulîzer nasnameyeke kûr a di navbera wê û bajêr de tîne pêşberî me, (Gulîzer, 2006, 35):

Dilê min bûye sûretê vî bajarî
Birinên min kuçeyên wî yeko yeko dinasin.

Mem Ronga di *Destên Min li Destên Te Digere* de cîh daye du helbestên simbolîk ku hatine terxankirin bo xaka xwezayî û bajarvanî: yek ji wan “Dicle” ye û ya dî “Diyarbekir” e. Di ya duyem de, helbestvanê ku li sirgûnîya Swêdê ye wan rojên havînê bi bîr tîne, ew rojên pir germ dike ku însan li “hênikahîyekê” bigerin, ev hênikahî ji torzîyên “şebeşên navdar” dide. Ji ber jara sirgûnîyê, bajar wiha tê bibîrxistin, (Arî, 2011, 75):

tu bajarê kevnare, mezin û bi tenê
bi çirisandinê reşemermer
û asîmanê xwe î biharî
di dilê min de leylan didî
li vê şeva mişextiya kambax.

Sîpan Xizan di “Keçika Amedê Ez im”ê de di hemû helbestê de xwe û bajêr dike wekhev û tevî risteya ku dubare dibe “Li Ameda xweş û şêrîn”, (Xizan, 2010, 69):

Kevoka aştiyê ez im,
Li Amedê, şêrîn ez im
Qasîde aştiyê ez im
Li Ameda xweş û şêrîn.

Di helbesta Sîpan de, helbestvan xwe û “xort” û “keçên” bajêr, xwe bi taybetmendiyên fizîkî û îradeya “aşî”, “demokrasi”, û yekîtîyê” ya bajarvanîyan re wekhev dike. Di helbesta din de, di “Welat” de, ew Kurdistan “ji Amedê digihîne Loristan”, ciwanên Amedê wêrek dike da ku sikakên Amedê bistînin û Kurdistana xwe ava bikin. Dîsa, di helbesta “Ez namirim” de wêrek dike ji bo berxwedanê “heta roja azadîyê”; bi awayekî dubarekirî pesnê welêt dide ji bo sipehîya bajêr. Însanan vedixwîne da ku bibin “karkerên azadîyê” û ji bo Kurdistanekê ku “benda karker û gundîyan” dişkîne ava bikin. Amed dîsa li vir, dibe payîtexta welêt. Xizan xwendevanên xwe wiha wêrek dike: “bi kevir û xwêdana karkeran/ heydê em ê vegerin Amedê vegerin qonaxê”. Ji ve wirdetir, ber bi dawîya helbestê ve Amed dîsa du caran dubare dibe, (Arî, 2011, 465):

Li Cizîrê, li Amedê,

Ser gora Ehmedê Xanê
Şahî çêkin li welatê xwe.

[...]

Ez nemirim ez nemirim!

Bibînim cejna li Amedê.

Herwiha, di helbesta “Qedera Welat” de, Sîpan Xizan, di peywendeke qedera reş ji bo welêt de, bang dike sembola Amedê, sembola bi hîseke girîngî û îftîxarê, hema berîya ku bang li mirovan bike “şoreş çêkin em li welat / ku dinyayê bihejînin”, di daxwazîya roja ku “Keyê me jî li Amedê / Rûniştîba li ser kûrsî ”, (Arî, 2011, 466).

Temsîlên neyînî yên bajêr piştî demekê rîyekê vedikin da ku hîsên germtir û aşîxwaztir bin bo bajêr. Feratê Dengizî, ku me ew li jor di pîrozbahîya Newrozê de dît, di helbesta “welatê min xweş e” de, (Arî, 2011, 587):

Pir hez dikim ji berbangên Amedê

Tew ku sirek bayê sibê yê Qerejdaxê jî hebe

Sibe bi rojê sor

Hêdî hêdî kuçe û sûk vedibe...

Di berhema Hîlmî Akyol a di 2014an de, *Gula Niştiman*, Amed hêmana dubarekirî ye. Di dîtina mijarên rêzikî yên derheqê bajêr de ev mimkun e. Bikaranîna sembola Newrozê û “jinkirina” bajêr di vê berhemê de jixwe li jor hatibû îfadekirin. Diyarbekir herî kêr di sê helbestên cuda de dixuye: “Ez Agir im”, “Amed” û “Keça Amedê”. Helbesta duyem, “Amed” (di sala 1991ê de hatîye nivîsandin), bi awayekî reterast hatîye terxankirin bo bajêr, bajar bi taybetîyên xwe yên fîzîkî bi awayekî hurgilî tê teswîrkirin, (Akyol, 2014, 8):

Bedena bilind

Bi pir derî,

Kevirên reş

Hatine rezkîrin

Weke mircan.

Li Rojava Derê Riha
Li bakur Derê Çîyê
Li rojhilat Derê Nû
Li başûr Derê Mêrdîn.
Deriyên bi nav û nîşan.

Navkela wê
Weke qesrek
Ji kevirên dir
Ava kaniya şêr
Sartirîn ji qeşemê.
Bajarê kevnar e
Hem bi mizgeft û hem bi dêr e.

Akyol derîyan bi Çemê Dijleyê, Pira Deh-Çav û sipehîyên bajêr ve bi nav dike, lê gelek bîranînên Amedê weke “armanca Şêx Seîd/ tirba şehîdên darkirî”. Bajar: “ Tîrek e di hîşê dijmin de/ dibistana ciwanên kurd e, / bajarê navdar Diyarbekir”. Avahî, xan û mizgeft bi bajêr re tîr teswîrkirin weke “diranên ciwanekî 16 salî”: Mizgefta Mezin, Xana Hesana Paşa, Xana Dînan, Birca Heft Bira, (Akyol, 2014, 9):

Amed navenda bajarên
Li der û dora xwe.

Diyarbekir
Bûka rind û hêja.
Di dest û di bin zilma neyar de
Îro di berxwe dide,
Nav û nîşanên
Pêşmergan.

Li bircên wê
Hatî nivisandin
Amed Serbajarê Niştiman.

Ji nû ve gihandina Barnas a helbesta damezrîner “Min Navê Xwe Kola li Bircên Diyarbekir”, Akyol bi xeyalî û tesewirî pêvajoya derkolonîkirina bajêr bi dawî dike, mekanê derveyî yê zeftkirî, dagirkirî, dibe mekanekî azad û navendî: “li ser dîwarên bajar/ hatiye nivisandin/ Amed, payîtexta welat.”

Ev mînakên ku ji wêjeya kurdî ya hevçax hatine girtin, guherîna nîrxê sembolîk ê bajêr piştrast dike. Xencî çend alîyên nedîyar ên Diyarbekirê, wek mînak berhemên Uzun û Cewerî, di mînakên din de em dibînin ku çawa bajar bûye cihê sirgûniyê, ku ji alîyê gotara Kemalîzmê û politikayên dewletê ve dorpêç bûbû, veguherî û bû navendeke sembola cografya û nasnameya kurdî. Ji xetên neteweya tirk, bû navenda komela xeyalî ya Kurdistanê.

Çavkanî:

- Adivar, Halide Edib. 2000. *Zeyno'nun Oğlu*. Can Yayınları.
- Adivar, Halide Edib. 2000. *Kalp Ağrısı*. Can Yayınları.
- Aktar, Ayhan. 2009. “‘Turkification’ Policies in the Early Republican Era.” In *Turkish Literature and Cultural Memory “multiculturalism” as a Literary Theme after 1980*, 29–62. Harrasowitz Verlag Wiesbaden.
- Akyol, Hilmî. 2014. *Gula Niştımanan*. İstanbul: Do.
- Arî, Arjen. 2011. *Bakûre Helbestê Antolojîya Helbesta Bakûr*. İstanbul: Evrensel Basım.
- Barnas, Rojen. 2013. *Kadiz*. İstanbul: Nûbihar.
- Butor, Michel. 1982. “La Ville Comme Texte.” In *Répertoire V*, edited by Michel Butor. Paris: Les Éditions de Minuit.
- Çaglayan, Ercan. 2014. *Cumhuriyet'in Diyarbekir'da kimlik insasi (1923-1950)*. İstanbul: İletişim.
- Casier, Marlies. 2011. “Beyond Kurdistan? The Mesopotamia Social Forum and the Appropriation and Re-Imagination of Mesopotamia by the Kurdish Movement.” *Journal of Balkan and Near Eastern Studies* 13 (4): 417–32. doi:10.1080/19448953.2011.621792.
- Cegerxwîn. 2002. *Agir û Pirûsk*. İstanbul: Avesta.
- Cewerî, Firat. 2008. *Ez ê Yekî Bikujim*. İstanbul: Avesta.
- Cleary, Joe. 2002. *Literature, Partition and the Nation-State Culture and Conflict in Ireland, Israel and Palestine*. Oxford; New York: Cambridge University Press.
- Cresswell, Tim. 2004. *Place : A Short Introduction*. Malden, MA: Blackwell Pub.

- Deleuze, Gilles, and Félix Guattari. 1987. *A Thousand Plateaus: Capitalism and Schizophrenia*. Minneapolis: University of Minnesota Press.
- Dorransoro, G., and N. F. Watts. 2009. "Toward Kurdish Distinctiveness in Electoral Politics: The 1977 Local Elections in Diyarbakir." *International Journal of Middle East Studies* 41 (3): 457–78.
- Duhokî, Xelîl. 2013. *Antolojîya Helbesta Nû Ya Kurmancên Başûr*. Istanbul: Berbang.
- Galip, Özlem. 2015. *Imagining Kurdistan: Identity, Culture and Society*.
- Gambetti, Zeynep. 2005. "The Conflictual (trans) Formation of the Public Sphere in Urban Space: The Case of Diyarbakir." *New Perspectives on Turkey*, 43–71.
- . 2010. "Decolonizing Diyarbakir: Culture, Identity and the Struggle to appropriate Urban Space." In *Comparing Cities: The Middle East and South Asia*, edited by Kamran Asdar Ali and Martina Rieker, 95–127. Karachi: Oxford University Press.
- Gambetti, Zeynep, and Joost Jongerden. 2011. "The Spatial (re)production of the Kurdish Issue: Multiple and Contradicting Trajectories—introduction." *Journal of Balkan and Near Eastern Studies* 13 (4): 375–88. doi:10.1080/19448953.2011.621785.
- Gülhan, Abdülkerim. 2012. "Şehrengiz Türü ve Ravzi'nin Edincik Şehrengizleri." *Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic* 7 / 2 Spring: 515–45.
- Gulîzer. 2006. *Kezîyên jinebî*. Stenbol: Avesta.
- Güvenç, Muna. 2011. "Constructing Narratives of Kurdish Nationalism in the Urban Space of Diyarbakir, Turkey." *Traditional Dwellings and Settlements Review*, 25–40.
- Houston, Christopher. 2005. "Provocations of the Built Environment: Animating Cities in Turkey as Kemalist." *Political Geography* 24 (1): 101–19. doi:10.1016/j.polgeo.2004.07.008.
- . 2008. *Kurdistan: Crafting of National Selves*. Berg.
- Jongerden, Joost. 2007. *The Settlement Issue in Turkey and the Kurds an Analysis of Spatial Policies, Modernity and War*. Leiden; Boston: Brill. <http://dx.doi.org/10.1163/ej.9789004155572.i-355>.
- Karaosmanoğlu, Yakup Kadri. 1987. *Panorama*. İletişim yayınları.
- . 2013. *Ankara*, İstanbul: İletişim
- Korkusuz, M. Şefik. 2003. *Seyahatnamelerde Diyarbakir*. İstanbul: Kent.
- Lefebvre, Henri. 1996. *Writings on Cities*. Blackwell, Oxford.
- Metin, Yüksel. 2014. "I Cry Out So That You Wake Up: Cegerxwîn's Poetics and Politics of Awakening." *Middle East. Stud. Middle Eastern Studies* 50 (4): 536–53.
- Mîro, Newaf. 2007. *Ji te hezkirin*. İstanbul: Wesanên Pêrî.

- Öktem, Kerem. 2004. "Incorporating the Time and Space of the Ethnic 'other': Nationalism and Space in Southeast Turkey in the Nineteenth and Twentieth Centuries." *Nations and Nationalism* 10 (4): 559–78. doi:10.1111/j.1354-5078.2004.00182.x.
- . 2008. "The Nation's Imprint: Demographic Engineering and the Change of Toponymes in Republican Turkey." *European Journal of Turkish Studies* 7.
- Omerî, Bro. 2013. *Rewşa Welat*. Istanbul: Avesta.
- Öncü, Ayşe. 2011. "Representing and Consuming 'the East' in Cultural Markets." *New Perspectives on Turkey (SI)* 45: 49–73.
- O'Shea, Maria Theresa. 2004. *Trapped between the Map and Reality: Geography and Perceptions of Kurdistan*. London: Routledge.
- Özgür, Veysi. 2007. *Bêje*. Istanbul: Doz.
- Polat, Lokman. 2003. *Helbestên Sirgûnîyê*. Beyoglu, Istanbul: Wesanên Veng.
- Preston, Peter, and Paul Housley. 1994. *Writing the City Eden, Babylon, and the New Jerusalem*. London; New York: Routledge.
- Scalbert-Yücel, Clémence. 2009. "The Invention of a Tradition: Dîyarbakır's Dengbêj Project." *European Journal of Turkish Studies [on Line]* 10.
<http://ejts.revues.org/4055>.
- . 2010. "Le Monde Rural Dans La Poésie Contemporaine Kurmandji En Turquie." *Etudes Rurales* 2 (186): 248.
- Shamilov, Arab. 2009. *Şivanê Kurmanca*. Yenisehir, Diyarbakir: Lîs Basın-Yayın.
- Şikakî, Evîn. 2012. *Fîxana Pênûsên Nazik - Antolojîya Helbesta Kurdî Ya Nûjen (Helbestvanên Jin)*. Amed: Ronahî.
- Soja, Edward W. 1996. *Thirdspace: Journey to Los Angeles and Other Real-and-Imagined Places*. Oxford: Blackwell Publishing.
- Temo, Selim. 2007. *Kürt Siiri Antolojisi*. 2 vols. Taksim, Istanbul: Agora Kitaplığı.
- . 2011. *Türk Siirinde Tasra*. Istanbul: Agorakitaplığı.
- Üngör, Ugur Ümit. 2012. *The Making of Modern Turkey: Nation and State in Eastern Anatolia, 1913-1950*. Oxford University Press.
- Uzun, Mehmed. 2005. *Tu*. Istanbul: Ithaki.
- Van Bruinessen, Martin. 2013. "Kurds and the City." In *Joyce Blau, L'éternelle Chez Les Kurdes*, edited by Hamit Scalbert-Yücel, Clémence (eds) Bozarslan, 273–95. Paris: Institut Kurde de Paris.
- Watts, Nicole F. 2010. *Activists in Office. Kurdish Politics and Protest in Turkey*. Seattle: University of Washington Press.
- Xizan, Sîpan. 2010. *Gulistana Sîpan*. Istanbul: Ava.

Yüksel, Ayse Seda. 2011. "Rescaled Localities and Redefined Class Relations: Neoliberal Experience in South-East Turkey." *Journal of Balkan and Near Eastern Studies* 13 (4): 433–55. doi:10.1080/19448953.2011.621788.

Zukin, Sharon. 1995. *The Cultures of Cities*. Cambridge, MA: Blackwell.